


GÖÇ ve İNSANİ Yardım Vakfı

www.giyav.org.tr

# LÊKOLÎNA NÊRÎN Û PÊŞNIYAZÊN ZAROKAN ÊN DER BARÊ SERPÊHATIYÊN WAN ÊN PÊVAJOYÊN PERWERDEHIYÊ YÊN DI SERDEMA PANDEMIYÊ DE



# LÊKOLÎNA NÊRÎN Û PÊŞNIYAZÊN ZAROKAN ÊN DER BARÊ SERPÊHATIYÊN WAN ÊN PÊVAJOYÊN PERWERDEHIYÊ YÊN DI SERDEMA PANDEMIYÊ DE

*" Ku pergaleke perwerdehiyê ya ku her kes wekhev be hebe, ez dixwazim ku ew be."*


KOMA PROJEYÊ

Berpirsiyara Projeyê : Çiğdem ERTAK

Şêwirmenda Projeyê: Meryem ÖZDEMİR OK

Kordînatora Projeyê: Ceylan PALAMUT AK

ŞÊWIRMENDÊN XEBATÊ Û KOMA PLANSAZIYÊ
Emrah KIRIMSOY
Ezgi KOMAN

NIVÎSERA NÛSAFÊ
Yeşim MUTLU

YÊN KU PIŞTGIRÎ DANE XEBATÊ
Yadigar DAĞ
Tuba BORAK
Ayşe EROL

XEBATA QADÎ
NAVENDA LÊKOLÎNÊN QADÎ YA SOSYO POLÎTÎK
EDÎTOR
Meryem ÖZDEMİR OK



Pûşper 2021

This project is funded by the European Union.
Bu proje Avrupa Birliği tarafından finanse edilmektedir.

HAKLARA DESTEK
İnsan Hakları Örgütlerini Destekleme Programı

Ev rapor di çarçoveya "Bernameya Alîkariya Gel" de, bi piştgiriya Yekîtiya Ewrûpa hatiye amade kirin. Berpirsyariya naverokê bi temamî girêdayî "Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê" ye. Nêrînên Yekîtiya Ewrûpa û Bernameya Alîkariya Gel nîşan nade û nahebîne.

# NAVEROK


| | | |
|---|---|---|
| 1. | DESTPÊK | 5 |
| 2. | DER BARÊ LÊKOLÎNÊ DE | 7 |
| 2.1 | Armanca Lêkolînê | 7 |
| 2.2 | Rêbaza Lêkolînê | 7 |
| 2.3 | Çarçoveya Lêkolînê | 8 |
| 2.4 | Astengiyên Lêkolînê | 8 |
| 3. | AGAHIYÊN GIŞTÎ | 9 |
| 4. | GOTINA ZAROKAN | 10 |
| 4.1 | Der Barê Pêvajoya Pandemiyê De Nirxandina Giştî | 10 |
| 4.2 | Nirxandina Der Barê Qada Perwerdehiyê De | 12 |
| 4.2.1 | Der Barê Pêvajoya Hîndekariyê De Agahiyên Giştî | 12 |
| 4.2.2 | Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Bidestxistina Alav û Amûrên Xwegihandina Perwerdehiyê | 13 |
| 4.2.3 | Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Perwerdehiyê De | 14 |
| 4.2.4 | Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Têkiliyan De | 18 |
| 5. | PÊŞNIYAZÊN ZAROKAN | 21 |
| 6. | NIRXANDIN Û ENCAM | 23 |
| 7. | ÇAVKANÎ | 26 |
| 8. | PÊVEK | 27 |
| | PÊVEK 1. ÇAVDÊRIYÊN DER BARÊ HEVDÎTINAN DE | 27 |
| | PÊVEK 2. SERLÊDANA WERGIRTINA AGAHIYAN Û BERSIVA WÊ | 28 |
| | PÊVEK 3. FORMA PIRSAN | 29 |

# PÊŞGOTIN

Mafê xwegihandina perwerdehiyê, ji bo her kesî mafekî gerdûnî ye. Li Tirkiyeyê di rewşa heyî de ji ber qeyran, pevçûn, şert û mercên civakî û aborî û hwd. bi taybetî di serî de zarokên keçîn, ji bo zarokên di temenên cuda de û li herêmên cuda di xwegihandina perwerdehiyeke baş û wekheviya derfetan de pirsgirêkên girîng tên jiyîn û pandemiyê kiriye, ku ev newekhevî hinekî din kûrtir bibin. Di nûsafa ku ji aliyê UNİCEF'ê ve di Adara 2021'an de hatiye weşandin de tê gotin, ku li tevahiya cîhanê ji 168 milyonan zêdetir zarok ji ber ku dibistanên wan bi sedema bergiriyên pandemiyê hatine girtin, ev salek e nikarin biçin dibistanê. Dîsa di heman nûsafê de tê gotin, ku nêzî 214 milyon zarok, bi gotineke din ji her 7 zarokan 1'ê nikaribûye xwe bigihîne ji çaran sisêyê perwerdehiya rû bi rû.

Wek Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê di çarçoveya projeya xwe ya Zimanê Dayîkê û Mafên Çandî ya ku ji Bernameya Piştgiriya Mafan alîkariyê werdigire de, bi armanca destnîşankirina pirsgirêkên ku zarok di dema pandemiyê de di xwegihandina perwerdehiyê de dijîn, me bi hevdîtinên ku bi bûrsiyerên weqfa me re hatin kirin, nûsafeke xebata qadî amade kir.

Encamên xebata qadî nîşan dan, ku her çiqas di pêvajoya pandemiyê de hewl hatibe dayîn, ku xebatên perwerdehiyê wek perwerdehiya ji dûr ve bên domandin jî, ev xebat pir kêm mane û bi taybetî jî xwegihandina perwerdehiyê ya zarokên di koma herî kêmderfet de di asteke girîng de asteng kiriye. Di hevdîtinên bi zarokên ku li bajarên wek Batman, Amed, Colemerg, Mêrdîn, Sêrt, Ruha, Şirnex, Wanê û hejmareke hindik li Stenbol û Mêrsînê dijîn re hatin kirin de hat dîtin, ku ji ber nebûna înternetê, ji bo perwerdehiya ji dûr ve nebûn an jî kêmbûna amûran, kêmasiyên ku di EBA TV'yê de derketine holê, di nav malê de karên zêdebar ên ku ketine ser milên zarokên keçîn, destpêkirina karên li gor rolên zayenda civakî yên zarokên keçîn û lawîn bi tenê zarok ji perwerdehiyê dûr nexistine, der barê dahatûya wan de xetereyên girîng jî derxistine holê.

Di nûsafê de li gel encamên hevdîtinan, tiştên ku zarokan der barê vê pêvajoyê de bi gotinên xwe anîne ziman û bi nêrîna zarokan bandorên pêvajoya pandemiyê cih girtine.

Wek weqfeke ku di qada mafên zarokan de xebatan dimeşîne û ji bo zarokên ku di koma herî kêmderfet de cih digirin, piştgiriya xwegihandina perwerdehiyê dide, me xwest em nêrînên zarokên ku em piştgiriyê didin wan, wergirin û bi riya vê nûsafê parve bikin.

Em minetdarên endamên lijneya xwe ya şêwrê yên hêja Emrah Kırımsoy û Ezgi Koman ên ku ji bo plansaziya vê xebatê û amadekirina naverokê piştgirî dan me ne. Em spasiyên xwe pêşkêşî Yeşim Mutlu ya ku piştgirî da amadekirina nûsafê û Navenda Lêkolînên Qadî ya Sosyo Polîtîk a ku di xebatên qadî de piştgirî da me, dikin.

Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê

# 1. DESTPÊK

*Mafê her zarokî/ê ye ku perwerdehiyeke baş wergire û ji bo pêkhatina vî mafî divê bal li ser cihê hîndekariyê, pêvajoyên hîndekarî û hînbûnê û materyalên wê û herî dawiyê jî çawaniya encamên hîndekariyê be.*

Peymana Mafên Zarokan a NY'yê Şîroveya Giştî No.1 (2001: 11)

Mafê perwerdehiyê mafekî mirovan ê bingehîn e û xwegihandina perwerdehiyeke baş, bêyî ku bi tu awayî cudakarî bê kirin, ji bo her kesî mafekî gerdûnî ye. Mafê perwerdehiyê, bi gotineke giştî, sûdwergirtina her kesî ya ji perwerdehiya bingehîn a bêpere ye. Di gelek peymanên navteweyî yên wek Danezana Mafên Mirovan a Gerdûnî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) (Xal 26), Peymana Mafên Çandî, Civakî û Aborî ya NY'yê (Xal 13), Protokola Pêvek a Bi Hejmara 1 a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (Xal 2), Peymana Mafên Zarokan a NY'yê (Xal 28-29) mafê perwerdehiyê cih digire û bi vî awayî mafê perwerdehiyê ji aliyê dewletên alîgir ve tê misogerkirin.

Mafê perwerdehiyê bi pêkanîna armanca pêşxistina kesayet, behremendî, behremendiyên hizrî û bedenî yên zarokan re di nav têkiliyeke nêzik de ye. Mafê perwerdehiyê di heman demê de girêdayî anîna cih a mafên mirovan ên ji derveyî perwerdehiyê ye jî. Ji ber vê yekê jî, "mafê perwerdehiyê û mafên mirovan ên wekî din bi hev ve girêdayî ne." (Ataman, 2008: 20). Ji ber vê sedemê, mafê perwerdehiyê, ji bo bicihanîna mafên mirovan û mafên zarokan xwediyê girîngiyeke bingehîn e. Bi vî awayî dê pêwîstiya xebatên çavdêrî û nirxandinê yên der barê bikaranîna mafê perwerdehiyê û xwe gihandina perwerdehiyeke baş de derkeve holê. Bi viya re têkildar behskirina ji çarçoveya 4A ya ku ji bo fêmkirina têgînî ya mafê perwerdehiyê tê bikaranîn, girîng e. Ev çarçove bi tenê têkiliyên navbera pêkhateyên ku mafê perwerdehiyê pêk tînin, nîşan nade, di heman demê de berpirsiyariyên dewletan ên der barê mafên mirovan de li ber çavan digire û bi mafan re têkiliya wê datîne holê. Çarçoveya 4A'yê dîsa ji bo pêdiviyên bicihanîna mafê perwerdehiyê jî mînakan dide (Ataman, 2008: 15).

Weke ku di tabloya li jêrê de jî tê dîtin û gava ku naveroka vê xebatê li ber çavan bê girtin, di çarçoveya 4A'yê de mafê perwerdehiyê bi taybetî dikare li ser bingeha berdestbûnî û xwegihandinê bê nirxandin. Wateya berdestbûniyê di bingeha xwe de ferzbûn û bêperebûna perwerdehiya seretayî û perwerdehiyeke baş e. Ji bo ku ev jî pêk bên, veqetandina budçeyê, ji bo zarokên ku dema wan a perwerdehiyê hatiye çawanî û mêjeriya cihên perwerdehiyê yên ji bo zarokan guncav û mafên kedkarên perwerdehiyê wek pêdivî destnîşan dike. Xwegihandin jî têkildarî rakirina cudakariyê û hemû astengiyên li pêşiya xwegihandina perwerdehiyê yên zagonî, rêvebirî û aborî ye. Di vê wateyê de xwegihandin di heman demê de hundirandinê jî dixwaze. Wek gotineke zêdebar, xwegihandin bi taybetî têkildarî astengiyên wek destmiz, dûrbûn û demê yên ku dikarin derkevin pêşiya zarokên di dema perwerdehiya ferz de, ye.

.

<table>
<tr><td rowspan="2">Mafê Perwerdehiyê</td><td>Berdestbûnî (Availability)</td><td>- Veqetandina budçeya li gor berpirsiyariyên têkildarî mafên mirovan,<br>- Ji bo zarokên ku hatine dema dibistanê dibistanên guncav (hejmar û cure),<br>- Mamoste (perwerdehî û hîndekarî, wergirtina kar, mafên karkeran, azadiyên sendîkayîbûnê)</td></tr>
<tr><td>Xwegihandin (Accesibility)</td><td>- Jiholêrakirina astengiyên zagonî û rêveberî<br>- Jiholêrakirina astengiyên aborî<br>- Pênasekirin û jiholêrakirina cudakariya li pêşiya xwegihandinê<br>- Jiholêrakirina astengiyên li pêşiya perwerdehiya ferz (destmiz, dûrî, dem)</td></tr>
<tr><td rowspan="2">Di Perwerdehiyê De Maf</td><td>Bikaribe bê pejirandin (Acceptability)</td><td>- Biryara malbatan a der barê perwerdehiya zarokan de (bi awayekî li gor mafê mirovan)<br>- Pêkanîna pîvanên herî kêm (çawanî, ewlehî, tenduristiya hawirdorê)<br>- Hînkirina ziman<br>- Azadiya derbirandinê<br>- Pejirandina mafên zarokan</td></tr>
<tr><td rowspan="2">Bikaribe bê adaptekirin (Adaptability)</td><td>- Zarokên kêmariyan<br>- Zarokên çermesoran<br>- Zarokên ku dixebitin<br>- Zarokên koçber û gerok</td></tr>
<tr><td>Mafên Bi Riya Perwerdehiyê</td><td>- Bikaranîna mafên li gor temen<br>- Jiholêrakirina zewicandina zarokan<br>- Jiholêrakirina karkeriya zarokan<br>- Astengkirina leşkerên zarok</td></tr>
</table>

Tablo 1: Çarçoveya 4A ya ku Raportorê Taybet ê Mafên Perwerdehiyê yê NY'yê di vekolandina berpirsiyariyên têkildarî mafê perwerdehiyê de bi kar aniye.

Tevî hemû lixwegirtinên ku di peymanên navneteweyî yên têkildarî mafên perwerdehiyê de cih girtine jî, li gor nûsafa Lijneya Navneteweyî ya Fînansmana Derfetên Perwerdehiyê yên Kurewî ya bi navê Nifşa Ku Hîn Dibe: Ji Bo Cîhana Ku Diguhere Razemeniya Perwerdehiyê ya ku di Rezbera 2016'an de belav kiriye, "li gel armanca sereke ya ku her zarokê/î bigihîne dibistanê û hîndekariyê ya ku hatiye pejirandin jî, dema ku sal bibe 2030, li welatên kêmdahat dê ji siséyan duduyan zêdetirê zarokên di dema dibistanê de nebûbin xwediyê şarezahiyên bingehîn." (UNICEF, 2016). Li gel vê yekê di nûsafa navborî de ev xalên li jêrê jî hatine destnîşankirin:

- Li welatên xwediyê dahata kêm û dahata navinc, ji zarokên dema dibistana seretayî bi tenê nîvî, ji xwendekarên dema perwerdehiya navîn jî ji çaran yekê hinekî zêdetir dikarin bibin xwediyê şarezahiyên bingehîn.
- 330 milyon xwendekarên dibistana seretayî û navîn nabin xwediyê zanîneke bingehîn a hîndekariyê jî.
- Her ku gelhe zêde dibe, qeyran jî kûrtir dibe. Dema ku sal bibe 2030, li welatên xwediyê dahata kêm û dahata navinc li gor texmînan dê 1,4 milyar zarokên dema dibistanê hebin.
- Hejmara zarokên keçîn ên ku qet naçin dibistanê, dê du qatî zarokên lawîn ên di heman rewşê de be. .

Li gel vana hemûyan tê zanîn, ku di serdemên qeyranan de bi taybetî di serî de zarokên keçîn, derfetên perwerdehiyê yên hemû zarokan kêm dibin. Di vê çarçoveyê de, wek encama veguherînên ku pandemiya Covid-19 a ku di Berfanbara 2019'an de li Çînê derket holê û tevahiya cîhanê girt bin bandora xwe, bi xwe re anîn û newekheviyên ku berbiçav kirin, têkildarî veqetîna zarokan a ji perwerdehiyê şiyariya "nifşa wenda" hat kirin. UNICEF'ê di Adara 2021'an de nûsafek belav kir û di nûsafê de tê gotin, ku li tevahiya cîhanê dibistanên ji

168 milyonan zêdetir zarokan ji sedema bergiriyên COVID-19'ê hema bibêje salak e, girtî ne. Dîsa di heman nûsafê de tê gotin, ku nêzî 214 milyon zarok, bi gotineke din ji her 7 zarokan 1'ê nikaribûye xwe bigihîne ji çaran sisêyê perwerdehiya rû bi rû.

Weke ku tê zanîn li Tirkiyeyê jî pêşiyê navber dan perwerdehiya li dibistanan, ji 23'yê Adara 2020'an şûn de jî ji bo tevahiya astên perwerdehiyê pergala perwerdehiya ji dûr ve hat pejirandin û hewl hat dayîn ku ev pergal bi riya malpera EBA'yê ya webê û TRT EBA TV'yê bê meşandin. Ji Adara 2020'an şûn de di navberên cuda û astên perwerdehiyê yên cuda de dibistan hatin vekirin lê ji ber ku pêşî li pandemiyê nehat girtin û pêvajo baş nehat birêvebirin, di perwerdehiya rû bi rû de domdarî nehat pêkanîn.

Her çiqas ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Neteweyî ve ji bo xwegihandina perwerdehiya ji dûr ve xebatên cuda hatibin kirin jî, perwerdehiya ji dûr ve bi xwe re gelek newekhevî anîne û bi taybetî jî xwegihandina perwerdehiyê ya zarokên ku herî zêde ji derfetan bêpar in, di asteke girîng de asteng kiriye. Li gel vê yekê ji ber kêmasiyên ku di pergala EBA'yê de derketin holê, bi tenê ne sûdeweriya perwerdehiya ji dûr ve, çawaniya wê jî bûye mijara nîqaşan.

Di vê çarçoveyê de ev xebata ku ji aliyê Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê ve bi hevdîtinên ku bi 119 zarokan re hatine pêkanîn, hatiye kirin, xwestiye ku di pêvajoya Covid-19'ê de rewşa xwegihandina perwerdehiyê li gor nêrîna zarokan binirxîne. Em hêvîdar in, ku ev nûsafa ku di encama vê xebatê de derketiye holê, bibe gotina zarokan û nêrîna zarokan di hemû xebatên ku dê bên kirin de bi awayekî ku sûdeweriya zarokan a bilind li ber çavan bigire, bê bikaranîn.

# 2. DER BARÊ LÊKOLÎNÊ DE

## 2.1 Armanca Lêkolînê

Pandemiya Covid-19'ê di gelek qadên jiyanê de nediyariyeke ku heta niha nehatiye jiyîn, bi xwe re derxistiye holê. Vê pêvajoya nediyariyê ji bo mezinan bi xwe jî gelek pirsgirêkên ji qada xebatê bigire heta bidestxistina çavkaniyên debarê, parvekirina barê karên nav malê û heta dijwariyên civakî û derûnî bi xwe re anîne. Wek ku dê bê texmînkirin ji gelek aliyan ve bandoreke neyînî li zarokan jî kiriye. Bêguman yek ji guherînên ku herî zêde bandor li zarokan kiriye jî, bi qasî mirov bibêje tune bûne, sînordarbûna têkiliyên civakî û astengbûna perwerdehiyê ye. Ev rewş li ber çavan hatiye girtin û ev xebat bi armanca di pêvajoya pandemiya Covid-19'ê de şopandina mafê xwegihandina perwerdehiyê û destnîşankirina qadên bipirsgirêk, hatiye kirin.

## 2.2 Rêbaza Lêkolînê

Lêkolîn bi riya hevdîtina telefonê ya ku bi xwendekarên ku Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê (GİYAV) bûrsa perwerdehiyê dide wan re pêk hat. Xebat bi riya formeke anketê ya ku hatibû amadekirin hat kirin. Ji bo ku xwendekar bikaribin nêrînên xwe yên der barê qada perwerdehiyê de vebêjin pirsên bê vebijêrk jî hatin pirsîn. Dema ku xebat hat meşandin hem ji dê û bavên zarokan û hem jî ji zarokan destûr hat wergirtin. Zarokên ku nexwestin hevdîtinê bidomînin jî hebûn, ji bo yên ku nexwestin hevdîtinê bidomînin hewla îknakirinê nehat dayîn û hevdîtinên ku hatibûn plankirin, hatin betalkirin.

## 2.3 Çarçoveya Lêkolînê

Di çarçoveya lêkolînê de bi xwendekarên ku bûrsîyerên Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê (GİYAV) ne re hevdîtin hatin pêkanîn. Di Mijdara 2020'an de ji bo xebata şopandin û lêkolînê plansaziya giştî hat amadekirin. Der barê naverok û armanca xebatê de dayîk û bav û zarokên ku dê beşdarî xebata şopandinê bibin, bi awayekî giştî hatin agahdarkirin. Di çarçoveya xebatê de me hewl da, ku em xwe bigihînin tevahiya bûrsiyerên ku hejmara wan 273 ye. ji 273 zarokan me xwe negihand hinekan û hinekan jî nexwestin beşdarî hevdîtinê bibin. Wek encam ev xebat bi 119 zarokên ku bûrsiyerên GİYAV'ê bûn re hat kirin. Temenê zarokên ku bi wan re hevdîtin hatiye kirin, di navbera 7 û 17'an de bû. Hevdîtin bi piranî bi qasî 20 û 25 deqîqeyan domiyan. Piraniya zarokên ku beşdarî vê xebatê bûn li bajarên Batman, Amed, Colemerg, Mêrdîn, Sêrt, Ruha, Şirnex û Wanê dijiyan, hejmareke hindik a zarokan jî li Stenbol û Mêrsînê dijiyan.

## 2.4 Astengiyên Lêkolînê

Di der barê mijarên ku wan eleqedar dikin de vegotina nêrîna xwe ya zarokan, çawa ku pêdiviyeke beşdariya zarokan e, di heman demê de ji bo vê yekê amadelkirina şert û mercan jî berpirsiyariya mezinan e. Wergirtina nêrînên zarokan dibe ku bi gelek amûrên cuda bê pêkanîn. Lê ji ber ku şert û mercên pandemiyê li ber çavan hatin girtin, pêkan nebû ku em vê xebatê û hevdîtinan li cihên ewle yên ku dikaribûn bên amadekirin bi awayekî hevdîtinên rû bi rû pêk bînin. Ji ber vê yekê jî ev xebat bi rêbaza hevdîtina telefonan pêk hat. Em dikarin bibêjin ku ev astengiya lêkolînê ya pêşîn bû. Di piraniya hevdîtinan de em pê hesiyan, ku endamên malbatê mudaxaleyî derbirandina zarokan dikin. Piştî ku kesên lêkolîn dikirin, di vê der barê de dê û bavên zarokan şiyar kirin, wergirtina nêrîna zarokan bi vegotina wan pêkan bû. Bi vî awayî yek ji astengiyên herî girîng ên vê xebatê, bêyî ku rewşa pêewlebûnê baş pêk bê, bi riya telefonê pêkanîna hevdîtinan bû. Lê dîsa jî em wisa difikirin, ku ev xebat ji bo şopandina xwegihandina mafê perwerdehiyê û sûdewerbûna ji bo wergirtina nêrînên zarokan girîng e.


Li gel vê yekê di çarçoveya lêkolînê de bi tevahiya bûrsiyeran re hevdîtin pêk nehat. Ku me xwe bigihanda hejmareke zêdetir a zarokan, dê ji bo derketina holê ya zêdetir cureyên pirsgirêkên ku di xwegihandina mafê perwerdehiyê de tên jiyîn, girîng bûya lê nêrînên 119 zarokên ku beşdarî vê lêkolînê bûn jî, ji bo diyarkirina çarçoveyeke giştî têr kirin.

Wek gotina dawîn hevdîtinên bi zarokên ku temenê wan di navbera 7 û 13'an de bû, hêsantir pêk hatin. Zarokên ku temenê wan ji 13'an biçûktir bû, li gor yên ku temenê wan mezintir bû, di têgihîştina pirsan de dijwarî jiyan. Ji ber vê yekê jî ji bo hemû temenan bikaranîna heman forma pirsan, astengiyeke din a vê lêkolênê bû. Di vê wateyê de ev serpêhatî ji bo plansaziya xebatên ku dê ji niha û şûn de bên kirin, dê rê nîşanî me bide.

.


# 3. AGAHIYÊN GIŞTÎ

Di vê beşê de taybetiyên demografîk ên zarokên ku beşdarî vê lêkolînê bûne, hatine dayîn. Wek destpêk dema ku mirov li gor zayendê li rewşê binihêre, tê dîtin, yên ku beşdarî xebatê bûne, ji sedî 65 zarokên keçîn û ji sedî 54 jî zarokên lawîn in.




Grafîk 1. Vilabîyayîşê hûmarkî yê qeçekan goreyê cînsîyetî

Bi îhtimala ku hejmara xwişk û birayan di xwegihandina alav û amûrên perwerdehiyê de girîng e, di çarçoveya lêkolînê de pirsa ku xwişk û birayên wan hene yan na û ku hebin çend xwişk û bira ne, ji zarokên ku beşdarî hevdîtinan bû hat pirsîn. Li gor bersivên ku hatin dayîn, ji 119 zarokên ku beşdarî xebatê 2 ne tê de, xwişk û birayên hemûyan hebûn. Yê zarokekî 1, yê 15'an 2, yê 21'an 3, yê 24'an 4, yê 21'an 5, yê 16'an 6, yê 11'an 7, yê 4'an 8, yê 3'yan 9 û yê zarokekî 10 xwişk û birayên wan hene. Grafîka hejmara xwişk û birayan li jêrê hatiye dayîn.




Grafîk 2. Hejmara xwişk û birayên zarokên ku beşdarî xebatê bûne

Dema ku em li agahiyên ku zarokan dane dinihêrin, ji ber ku bersivên zarokên ku xwişk û birayên wan tune ne, yên ku bersiv nedane pirsê û yên bi hejmarê nizanibûne, nehatine hesibandin, li mala 83 zarokan herî kêm zarokeke/î di navbera 6 û 18 saliyê de, ku mirov dikare bibêje temenê perwerdehiyê de ne, heye.

# 4. GOTINA ZAROKAN

## 4.1 Der Barê Pêvajoya Pandemiyê De Nirxandina Giştî

*Erê wele pir xerab [bandor] kir, jiyana min a dibistanê bi dawî bû.*

*(Amed , 11, L)*

Armanca me ya ji pirsîna pirsên di vê beşê de, fêmkirina nirxandinên zarokan ên giştî yên der barê di pêvajoya pandemiyê de rojeke wan çawa derbas bûye û têgihîştina ka vê pêvajoyê bandoreke çawa li jiyana wan kiriye û di vê pêvajoyê de mijarên ku herî zêde zor dane wan çi bûne, bû.

Ji bo vê yekê me pêşiyê pirsa "Pandemî didome. Rojeke te çawa derbas dibe? Gelo tu dixwazî bi me re parve bikî? Tu saet di çendan de radibî? Tu çi dikî? Bi kê re dikî?" ji zarokan pirsî. Dema ku mirov li bersivên ku ji bo vê pirsê hatine dayîn dinihêre, beriya her tiştî du zarokên keçîn gotin, ku ew naxwazin bersivê bidin vê pirsê. Zarokan ji bo çalakiyên ku di nava rojê de dikin, gotin, ku bi piranî rûdinên, bi hevalên xwe re li derve rûdinên, li dersan dixebitin, pirtûk/çîrokan dixwînin, bi lîstikan dileyîzin û hwd. Piraniya yên ku gotine em derdikevin derve, zarokên lawîn in. Li gel vana zarokên ku gotine, "Ez alîkariya diya xwe dikim, paqijiyê dikim û hwd." jî hebûn. Yên ku ev gotin kirine bi piranî zarokên keçîn in û bi tenê yek lawîn e. Ev yek jî şopên newekheviya zayenda civakî nîşan dide û ji ber vê yekê girîng e. Lê ev yek dike, ku bi taybetî ji bo zarokên lawîn cudahiyeke bi vî rengî derkeve holê: Bi taybetî ku di qada giştî de karek hebe, wisa dixuyê, ku ev kar bi piranî wek karê zarokên lawîn tê zanîn û ji ber vê yekê beşek ji zarokên lawîn gotine, ku "Ez di kar de alîkariya bav û kalê xwe dikim, ez diçim kar." Bêguman ev bersiv, di rewşa ku xwegihandina perwerdehiyê û cihên perwerdehiyê bê astengkirin de, ev astengkirin ji bo zarokên lawîn û keçîn bi xwe re encamên rolên zayenda civakî yên cuda derdixe holê.

Di vê binbeşê de wek gava duyemîn ji zarokan pirsa "Dema ku tu li rewşa xwe û ya zarokên din dinihêrî pandemiyê bandoreke çawa li jiyana te kir?" hat pirsîn. Di bersivên vê pirsê de du zarokan gotin, ku pêvajoya pandemiyê zêde bandor li jiyana wan nekiriye. Du zarokan jî gotin, ev pêvajo ji bo wan sûdewer bûye.

*Kir ku em zêdetir bala xwe bidin perwerdehiyê, me qîmeta wê fêm kir. (Mêrdîn, 13, K)*

*Ji bo min sûdewer bû. (Mêrdîn, 16, L)*

Ji derveyî çar zarokên ku li jorê behsa wan hat kirin, hemû zarok dibêjin, ku pêvajoyê bi awayekî neyînî bandor li wan kiriye. Li jêrê der barê vê yekê de mînakên ji vegotinên zarokan hatine dayîn.

*Bi awayekî neyînî bandor kir, ji bo me zarokan girêdana bi jiyana dîjîtal ve dest pê kir. (Amed, 17, K)*

*Ji ber vîrusê bi awayekî neyînî bandor bû. Birayê min her tim derdikeve derve. Birayê min ê dinê nexweş e lê nikare tedawî bibe. (Şirnex, 11, L)*

*Ji aliyê derûnî ve pêvajoyeke pir dijwar e, em pirsgirêka balê dijîn. Di pêvajoya pandemiyê de mayîna me ya li malê ji min re wek tiştekî derî aqilan tê, em di pêvajoya xwe ya herî çalak de tên astengkirin. Li gor dane û îstatîstîkan derneketina me çewt e. (Colemerg, 17,L)*

*Pir xerab bandor kir, xwezî jiyana me wek berê bûya. Ez nikarim mamosteyên xwe bibînim, nikarim destên kalê xwe ramûsim, xemgîn im. (Amed, 14, K)*

*Perwerdehî pir xerab bandor kir, êdî çalakiyên civakî tune ne. Em nikarin bi hevalên xwe re demê derbas bikin, ev pir xerab e. (Şirnex, 14, K)*

Di vegotinên zarokên ku gotine, bi awayekî neyînî bandor li wan kiriye de her çiqas bûyerên wek jiyîna dijwariyên derûnî, ferzkirina li malê mayînê, neçûna dibistanê, nebûna alav û amûrên wek înternet, tablet û kompîturê yên ku ji bo perwerdehiya ji dûr ve bûne pêdiviyên bingehîn, nedîtina hevalên xwe derketibin pêş jî; tê dîtin ku hinek rewşên taybet jî bandoreke neyînî li zarokan kiriye. Di serî de yên ku ew bi xwe yan jî ji malbata wan yek bi nexweşîna Covid-19'ê ketibin, diltirsî û xemgîniya ji ber vê rewşê bi awayekî zelal tê dîtin. Mînakên ku li jêrê hatine dayîn vê rewşê nîşan didin:

*Bi neyînî bandor kir, ji malbatê yên ku wefat kirin hebûn, ji bo me pêvajoyeke dijwar bû. (Amed, 14, K)*

*Dema ku ez bi Coronayê ketim, ez pir giriyam, lingên min û çokên min êşiyan, ez pir tirsiyam. (Stenbol, 13, K)*


Di asta duyemîn de, tê dîtin, ku bi pêvajoya pandemiyê re kêmbûna derfetên aborî yên malbatê û pirsgirêkên xwegihandina çavkaniyên debarê jî bandor li zarokan kiriye.

*Yên ku rewşa wan a aborî baş e, diçin dersxaneyê. Ez nikaribûm biçim. Zêde bandor li min kir. (Amed, 16, L)*

*Ji aliyê aborî ve zor da me, kes naxebite, em nikarin debara xwe bikin, çêlekeke me hebû, ew jî mir. (Ruha, 15, K)*

*Ji ber ku ez dernakevim derve û naçim dibistanê, ez bi ber dikevim. A din jî bavê min naxebite, ez bi ber wê jî dikevim. (Amed, 10, K)*

Wek xala sêyemîn û dawîn, di vê binbeşê de ji zarokan hat pirsîn, ku di pêvajoya pandemiyê de mijareke ku tê de zehmetî kişandine hebûye yan na, ku hebe tiştekî ku di der barê wê de parve bike heye yan na. Rewşa bersivên ku zarokan dane, di grafîka li jêrê de dixuyê. Li gor vê yekê, ji zarokên ku beşdarî lêkolînê bûne 32'yan gotine, ku di vê pêvajoyê de di tu mijaran de zehmetî nekişandine, 2'yan gotine, nizanim/nayê bîra min, 85'an jî gotine, ku zehmetî kişandine




Grafîk 3. Dabeşiya hejmarî ya bersivên ku zarokan dane pirsa "Di pêvajoya pandemiyê de mijarên ku te tê de zehmetî kişandin hebûn an na?"

Tevî ku mijarên ku zarokan di vê pêvajoyê de tê de zehmetî kişandine diguherin jî, tê dîtin ku bi piranî pirsgirêkên ku di xwegihandina perwerdehiyê de (neçûna dibistanê, têneketina EBA'yê, nebûna înternet an jî kompîturê) hatine jiyîn û kêmbûna derfetên têkiliyên civakî (derneketina derve, nedîtina hevalên xwe, bi hevalên xwe re neleyîstina lîstikan û hwd.) derdikevin pêş. Ji derveyî vana jî, kêmbûna derfetên aborî û ji ber Covid-19'ê windakirina lêzimên xwe, wek mijarên ku tê de zehmetî kişandine, hatine vegotin.

## 4.2 Nirxandina Der Barê Qada Perwerdehiyê De


*'Hevalên min ên ku nizanin EBA çi ye, hene û ev min pir xemgîn dike.'*

Pirsên di vê beşê de, ji bo fêmkirina nirxandinên zarokan ê der barê qada perwerdehiyê de hatine amadekirin. Di vê çarçoveyê de pirsên wek rewşa dibistan û perwerdehiya ji dûr ve çawan e, di vê pêvajoyê de ji mezinên li malê alîkarî wergirtine yan na, nêrînên wan ên der barê perwerdehiya rû bi rû û perwerdehiya ji dûr ve de, çawaniya têkiliyên wan ên bi mamoste, hevalên wan û kesên nav malê re hatin pirsîn. Bersivên ku ji bo van pirsan hatine dayîn di bin sernavên Der Barê Pêvajoya Hîndekariyê De Agahiyên Giştî, Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Bidestxistina Alav û Amûrên Xwegihandina Perwerdehiyê, Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Perwerdehiyê De û Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Têkiliyan De de hatine nirxandin.

### 4.2.1 Der Barê Pêvajoya Hîndekariyê De Agahiyên Giştî

Di bin vî sernavî de pêşiyê pirsa "Rewşa dibistanê çawan e?" ji zarokan hat pirsîn. Piraniya zarokan bersiva "Ne baş e." dan vê pirsê. Wek sedemên vê yekê jî, nekarîna şopandina dersan, di dersên zindî de kişandina zehmetiyê, encam wernegirtin, bêrîkirina hevalên xwe, hatine vegotin. Ji derveyî vana jî, zarokan gotin, beriya ku navberê bidin perwerdehî û hîndekariyê, rewşa dibistanê baştir bûye. Li gel vana tê dîtin, ji ber nebûna domdariya perwerdehiyê, bi gotineke din li dû hev vekirin û girtina dibistanan, zarok xistine nav nediyariyekê û bûye sedem ku zarok bi awayekî neyînî bandor bibin.

Weke ku di grafîka li jêrê de jî tê dîtin, piraniya zarokên ku di çarçoveya lêkolênê de hevdîtin bi wan re hatiye kirin, hîndekariya xwe bi riya perwerdehiya ji dûr ve didomînin. Der barê beşdarbûna perwerdehiya ji dûr ve de roj û saet jî ji xwendekaran hatine pirsîn. Lê curbicuriya bersivan careke din nîşan dide, ku hemû xwendekaran bi awayekî wekhev sûd ji perwerdehiya ji dûr ve wernegirtiye. Li gor bersivên ku zarokan dane, rojên perwerdehiya ji dûr ve di navbera 1 û 5'an de û saetên dersên rojane jî di navbera 1 û heftan de diguherin. Li vir xala herî girîng a ku divê binî wê bê xêzkirin, ev e: Xwendekarên ku perwerdehiya xwe nedomandine, ji ber sedemên nebûna alav û amûrên wek EBA, înternet, telefon, tabletê nedomandine. Ji derveyî vana li Ruhayê zarokekî lawîn ên 12 salî ji ber ku li ba bavê xwe xebitiye û zarokeke keçîn a 14 salî ya ku li Amedê dijî jî, ji ber ku kekê wê bi telefona bavê wê amadehiya zanîngehê dike, gotine ku nikaribûne beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bibin.




Grafîk 4. Dabeşiya hejmarî ya rewşa zarokan a domandina perwerdehiyê


Di çarçoveya lêkolînê de ji zarokan hat pirsîn, rojên ku naçin dinbistanê çi dikin. Zarokan bi piranî bersivên wek “dileyîzim”, “diçim gel hevalên xwe”, “li dersan dixebitim, pirtûkan dixwînim, spartekan çêdikim”, “li televîzyonê temaşe dikim” dane. Li gel vana hejmareke hindik a zarokan jî bersivên wek “diçim kursa Quranê/Quranê dixwînim”,  “diçim kar, di kar de alîkariya bavê xwe dikim” û “ez alîkariya diya xwe dikim” dane

## 4.2.2 Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Bidestxistina Alav û Amûrên Xwegihandina Perwerdehiyê

Armanca pirsên ku di vê beşê de hatine pirsîn, nirxandina hebûn û nebûna alav û amûrên ku ji bo xwegihandina perwerdehiya ji dûr ve pêwîst in ên zarokên ku hevdîtin bi wan re hatiye kirin e.

Wek destpêk dema ku me li hebûna înternetê ya li malê nihêrî, 44 zarokan gotin, ku li malê înternet tune ye, 66’an jî gotin ku heye. Li gel vê yekê, 3 zarokan bersiv nedan vê pirsê û zarokekî jî got, ku înternete cîrana bi kar tîne. Wek gava duyemîn dema ku hat pirsîn çawa dikevin înternetê, hejmara zarokên ku gotin, em înterneta cîranan bi kar tînin bû 3. Her çiqas hemû zarokan bersiva têkildarî ketina înternetê nedabe jî, dema ku bersivên hatine dayîn li ber çavan bên girtin, hejmara yên ku bi navgînên gerok dikevin înternetê ji hejmara yên ku înterneta malê bi kar tînin zêdetir e. Dema ku li pirsgirêkên navgînên gerok û sînorê daneyan bê fikirîn, mirov dikare bibêje, ku hejmareke zêde ya zarokan di xwegihandina perwerdehiya ji dûr ve de di rewşeke bidezavantaj de hatine hiştin.

Di çarçoveya vê beşê de, wek encam ji zarokan hat pirsîn, kompîtur, tablet û telefonên wan ên ji bo perwrdehiya ji dûr ve bi kar bînin, hene yan na. Weke ku dê di grafîka li jêrê de jî bê dîtin, di mala 69 zarokan de kompîtur, tablet û telefonên ku ji bo perwerdehiya ji dûr ve bi kar bînin, hebûn,  50 zarokan jî gotin, ku li mala wan ev amûr tune ne.




Grafîk  5. Dabeşiya hejmarî ya zarokên ku di mala wan de kompîtur, teblet û telefonên ên ku ji bo perwerdehiya ji dûr ve bên bikaranîn, hene û tune ne

Dema ku li dabeşiya amûrên zarokan ên ku di perwerdehiya ji dûr ve de bên bikaranîn, bê nihêrtin jî, weke ku di grafîka li jêrê de jî tê dîtin, mirov dibîne ku hejmareke pir hindik a zarokan xwediyê amûrên neguhêzbar ên wek tablet û kompîturê ne. Weke ku dê bê texmînkirin telefon jî bi piranê yên dayîk bavan in. Di vê rewşê de dema ku dayîk û bavên ku telefona wan tê bikaranîn, derkevin derve yan jî di rewşên wisa de, xetereya ku li gor bernameya zarok a perwerdehiya ji dûr ve tevnegerin dertê holê. Di tevahiya hevdîtinan de bi tenê zarokekî behsa Xala Piştgiriya EBA’yê kir:

> *Piştî ku xala piştgiriya EBA’yê çêbû, ez dikaribûm beşdar bibim. (Colemerg, 17, L)*




Grafîk 6. Dabeşiya hejmarî ya amûrên ku zarok ji bo beşdarbûna perwerdehiya ji dûr ve bi kar tînin

## 4.2.3 Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Perwerdehiyê De

Di vê beşê de armanc ew bû, ku di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de nêrînên zarokan ên der barê perwerdehiyê de bên wergirtin. Ji bo vê yekê jî, ji wan hat pirsîn, ka di perwerdehiya ji dûr ve de bi hêsanî beşdarî dersan bûne yan nebûne, ders ji bo wan sûdewer bûne yan na, daxwaz û xwestekên wan ên ji bo domandina perwerdehiyê çi ne.

Pêşiyê ji zarokan hat pirsîn; dema ku cara pêşîn dibistan ji ber pandemiyê hatin girtin, ka beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bûne yan na. Ji 113 zarokên ku bersiv dane pirsê, 80'yî gotine na û 33'yan jî bersiva "erê" daye. Zarokên ku bersiva "erê" dane, bi piranî gotine ku amûrên wek telefon û televîzyonê bi kar anîne. Di nav sedemên zarokên ku bersiva "na" dane de, nebûna amûrên wek înternet, tablet û telefonê derdikevin pêş. Li gel vê yekê zarokên ku sedemên wan ên cuda hebûn jî, hebûn. Mînakên têkildarî van sedeman li jêrê hatine dayîn:

*Ez qet beşdar nebûm, ji ber ku zaroka wî her tim nexweş bû apê min diçû nexweşxaneyê, ez nikaribûm beşdar bibim. (Amed, 17, K)*

*Bi tenê telefonek heye. Dersên min û xwişk û birayên min rastî hev tên. (Wan, 9, K)*

*Ji ber ku alav û amûr tune bûn, li malê jî kes tune bû, ku li malê kesek hebûya, qet nebûya ez ê bi telefona wan beşdar bibûma. (Amed, 14, L)*


*Diya min telefon hindik dida. (Colemerg, 9, K)*

*Ji ber pirsgirêkên derûnî min dev ji dibistanê berda (Amed, 17, K)*

*Nizanim, ji ber ku şîfreya min tune bû, ez beşdar nebûm. (Amed, 16, L)*

Wek nêrîneke zêdebar, tê dîtin tevî ku karibûne beşdar bibin jî rêjeyeke zêde ya zarokan bi awayekî nerêkûpêk beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bûne. Wek sedemên beşdarbûna nerêkûpêk jî wek bersiva ku dan pirsa beşdariyê, nebûna înternetê û alav û amûran, di malê de zêdebûna hejmara kesên di dema perwerdehiyê de, nezanîna pergalê, her tim nebûna derfeta çûyîna mala cîranan û xerabebûna televîzyonê hat gotin. Li gel vana, tê dîtin, dema

ku têkildarî perwerdehiyê pêdiviya zarokan bi tiştekî çêbûye yan jî ji bo dersan pêdiviya wan bi alîkariyê çêbûye, kesên ku ji wan re bûne alîkar, endamên malbata teng bûne. Lê li vir tiştê ku divê binî bê xêzkirin ev e: Hejmareke zêde ya zarokan gotin, ku kesê/a ku ji wan re bûye alîkar dayîk an jî eta wan bûye. Ji ber ku ev yek careke dinê nîşan dide, ku bi pêvajoya pandemiyê re giraniya karê nav malê ya li ser milê jinan zêdetir bûye, girîng e. Dîsa ji ber ku xwendin û nivîsandina dayîk û bavê hinek zarokan tune bûye, ev zarok ji alîkariya mezinan bêpar mane. Dîsa zêdebûna hejmara zarokan û bar û pirsgirêkên zêdebar ên ku di pêvajoya pandemiyê de derketine pêşiya dayîk û bavên zarokan jî kirine, ku zarok ji alîkariya mezinan bêpar bimînin.




Grafîk 7. Dabeşiya hejmarî ya bersivên ku zarokan dane pirsa "Dema ku dibistan ji ber pandemiyê hatin girtin, tu dikaribûyî (birêkûpêk) beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bibî?"

Der barê sûdewerbûna dersan de jî nêrînên zarokan hatin wergirtin. Ji 119 zarokan bi tenê 26 zarokan gotin, ku ew dersên ku bi riya televîzyon û înternetê werdigirin, sûdewer dibînin. Hejmareke hindik got fikreke min tune yan jî li gor min ne sûdewer bû û ne jî nesûdewer bûn. Ji derveyî vana hemû zarokên dinê gotin, ku ew dersên ku bi vî awayî tên dayîn sûdewer nabînin. Der barê wek nesûdewer nirxandina dersên perwerdehiya ji dûr ve de gotinên zarokan ên ku li jêr hatine dayîn, rewşê bi kinasî vedibêjin:

*Ji ber ku mafê axaftinê nehat dayîn. (Mêrdîn, 10, L)*

*Înterneta mamoste qut dibe, ez ji dersan fêm nakim. (Amed, 14, K)*

*Hinek ders sûdewer in lê hinek na, lewre nayên fêmkirin. Bêyî ku em fêm bikin derbasî ya dinê dibin. (Şirnex, 12, L)*


*Ez ji mijaran fêm nakim. (Semsûr, 13, L)*

*Em li dibistanê 40 deqîqeyan dersê dibînin. Di EBA'yê de 40 deqîqe temam nabe, înternet qut dibe. (Mêrdîn, 16, K)*

*Mamosteyê/a min heman kes nîn e. Ez tu tiştî fêm nakim. (Şirnex, 11, L)*


*Li gor mamoste diguhere. Nadin nivîsandin, hinek dibêjin wêneyê ekranê bikişînin. (Mêrdîn, 16, L)*

Ji zarokan hat xwestin ku dema ku diçûn dibistanê û li polê beşdarî dersan dibûn û dema perwerdehiya ji dûr ve bidin ber hev, bersivê ku hatin dayîn di grafîka li jêre de bi kinasî hatine dayîn. Di bersivên ku ji bo vê pirsê hatine dayîn de ji aliyê zayend û temen ve cudahiyeke watedar tune. Dîsa rêjeyeke têra xwe zêde ya zarokan gotin ku ew perwerdehiya rû bi rû ji bo xwe û ji ba zarokên din sûdewertir dibînin.




Grafîk 8. Dabeşiya hejmarî ya danberheviya çawaniya dema ku li dibistanê û di perwerdehiya ji dûr ve de hatiye derbaskirin

Pirseke din a ku ji zarokan hat pirsîn jî "Perwerdehiya ji dûr ve bandoreke çawa li te kir?" bû. Tevahiya zarokan bersiv dan vê pirsê. Weke ku dê di grafîka li jêrê de jî bê dîtin, zarokan bi rêjeyeke têra xwe zêde gotine, ku perwerdehiya ji dûr ve bandoreke neyînî li wan kiriye.




Grafîk 9. Dabeşiya hejmarî ya bersivên ku zarokan dane pirsa "Perwerdehiya ji dûr ve bandoreke çawa li te kir?"

Her çiqas zarokên ku gotin, "Ji ber nexweşînê ez xwe li malê ewletir", "ji tunebûnê baştir e" û nêrînên xwe yên erênî yên der barê perwerdehiya ji dûr ve vegotin, hebûn jî, tê dîtin piraniya zarokan ji ber sedemên wek beşdarnebûna dersan, bi hevalên xwe re derbasnekirina demê, ji ber pergala EBA'yê û nebûna înternetê û alav û amûrên pêwîst, bi awayekî neyînî bandor bûne. Li jêrê mînakên nêrînên zarokan ên ku gotine, bi awayekî neyînî ji perwerdehiya ji dûr ve bandor bûne, hatine dayîn.

*Divê destê min û zarokan bi hev nebe, ez nizanim ku ez ê çawa bileyîzim. Ku mirov bi tenê bi telefonê jî diaxive, tiştek nayê famkirin. (Amed, 12, K)*


*Ez nikarim beşdarî dersan bibim, ji ber xwişk û birayên min, dor nayê ser min. (Colemerg, 10, L)*

*Qet sûdewer nebû, weke ku dema min vala derbas dibe. (Mêrsîn, 17, K)*

*Min di jiyana asayî de telefon bi kar nedianî, ez niha her tim telefonê bi kar tînim. Ez êdî di dersên ku ez tê de pir serkeftî bûm de bi ser nakevim, dema ku ez bi telefonê beşdarî dersê dibim, ez xwe ne wek ku dersê dikim lê wek ku sûcekî bikim, hîs dikim. (Amed, 17,K)*

*Ez îsal diçim pola heştan. Ez nikarim bikevim EBA'yê, nikarim ji bo LGS'yê (ezmûna dibistana amadehiyê) bixebitim. (Amed, 13, L)*

Ji zarokan pirsa "Perwerdehiya ji dûr ve ji bo me hemûyan pêvajoyeke pir nû bû. Bi ya te kîjan rêbaz ji bo te û zarokên din sûdewer e?" hat kirin, wek ku di grafîka li jêrê de jî dixuyê piraniya zarokan gotin, perwerdehiya rû bi rû.




Grafîk 10. Dabeşiya hejmarî ya rêbazên perwerdehiyê yên ku zarokan sûdewer dîtine.

Dema ku li van sedeman tê nihêrtin, li gel nebûna înternetê û alav û amûrên pêwîst, nehatina gel hev a bi mamoste û hevalan re, bi gotineke din pêdiviya civakîbûnê jî bi ber çavan dikeve. Dîsa zarok haydar in ku hinek hevalên wan nikarin beşdarî perwerdehiyê bibin û di vê mijarê de balê dikişînin ser wekheviyê. Ev jî pir girîng e.

*Ji bo EBA'yê derfeta hinek xwendekaran tune bû. Lê ku perwerdehiya rû bi rû be, dê her kes bikaribe beşdar bibe. (Sêrt, 14, K)*

*Min dikaribû heval û mamosteyên xwe bibînim. (Amed, 12, L)*

*Em bikevin dersên zindî dê baştir be, wesayît tune, 3 xwişk û bira em ê bi çi biçin dibistanê. (Amed, 16, K)*

*Ku rû bi rû bûya dê pêdiviya me bi tiştekî wek înternetê tune bûya. Berê di jiyana min de bi tenê dersên min hebûn. (Colemerg, 13, K)*

*Em dikarin tiştên ku fêm nekin, bipirsin. (Şirnex, 13, K)*

Di vê binbeşê de herî dawiyê aliyên perwerdehiya ji dûr ve yên ji bo wan hêsan û yên ku zorê didin wan hatin pisîn. Ji %80'yî zêdetir zarokên ku beşdarî lêkolînê bûn, gotin ku di vê pêvajoyê de mijarên ku tê de zehmetî kişandine, hebûne. Hinek zarokan wek bersiva vê pirsê navê dersên wek matematîk, Îngilîzî, fenê gotin. Hinek zarokan jî behsa astengiyên wek ketina înternetê, nebûna alav û amûran, tênegihîştina dersan, nekarîna beşdarbûna dersan kirin. Dema ku bersiv ji aliyê zayend û temen ve bên nirxandin, der barê mijarên ku tê de zehmetî kişandine de cudahiyeke watedar nayê dîtin. Dema ku mirov bersivên pirsa aliyên hêsan ên perwerdehiya ji dûr ve binirxîne, tê dîtin ku ji bo ji nîvî zêdetirê zarokan tu aliyekî hêsanker ê pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve tune. Lê hejmareke hindik zarokan nêrînên xwe yên der barê aliyên hêsanker ên vê pêvajoyê de anîne ziman. Vegotinên zarokan ên têkildarî vê mijarê li jêrê hatine dayîn:

*Ji ber ku ez her tim li malê bûm, min zêdetir amadehiya YKS'yê (ezmûna zanîngehê) dikir. (Amed, 17, K)*

*Bi ya min pir hêsan bû, min xwe dirêj dikir û ji televîzyonê ders guhdar dikir. (Sêrt, 11, L)*

*Min zêdetir ji bo xwe dem veqetand. (Amed, 17, K)*

*Mayîna li malê ji bo min xweş bû. Dema ku ez diçûm dibistanê li min sar bû, li malê beşdarbûna dersan xweştir e. (Colemerg, 9, K)*

*Ji ber ku ez serê sibehê zû ranebûm, karê min hêsantir kir. (Amed, 11, L)*

## 4.2.4 Di Pêvajoya Perwerdehiya Ji Dûr Ve De Nêrînên Der Barê Têkiliyan De

Armanca pirsên di vê beşê de jî ew e, ku serpêhatiyên zarokan ên ji derveyî jiyana wan a perwerdehiyê û ku hebin, veguherînên di têkiliyên navbera wan û mamoste û hevalên wan de fêm bike. Di vê çarçoveyê de pêşiyê ji zarokan pirsa, "Di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de mayîna li malê çawa bû?" hat pirsîn. Ji nîvî hinekî kêmtirê zarokan gotin, ku di vê pêvajoyê de mayîna li malê bandor li wan nekiriye yan jî bi awayekî erênî bandor kiriye. Li gor nêrîna zarokên di vê komê de mijarên ku derdikevin pêş ev in; memnûnbûna ji mayîna bi malbatê re, parastina ji nexweşînê û leyîstina bi xwişk û birayên xwe re. Ji nîvî zêdetirê zarokan jî gotin ku mayîna li malê bandoreke neyînî li wan kiriye. Zarokên di vê komê de bi giranî gotinên wek "acizker" "fetisîner" "zor" bi kar anîn û rewş bi hevokên wek "nedîtina mamoste û hevalên xwe" "nezanîna ku dê çi bike" rave kirin. Lê ji derveyî vana jî zarokên ku gotin, dema mayîna li malê bi awayekî neyînî bandorê li wan dike jî hebûn. Û mînakên vê yekê li jêr hatine dayîn. Ev mînak di heman demê de ji aliyê nîşandana xetereyên ku dibe di pêvajoya pandemiyê û heta piştî wê jî derkevin holê û 'rewşa başbûnê' ya zarokan xera bikin ve bi taybetî girîng in.

*Em hîn nebûbûn ku bi xwişk û birayên xwe re tim li gel hev bin; ji ber ku her yek ji me xwediyê kesayetiyeke cuda ye, em her tim nîqaş dikin. Ji bo min tu aliyekî erênî tune bû. (Amed, 14, K)*

*Di malbatê de yên ku bi Coronayê ketin, hebûn. Ji ber vê yekê heval û cîranên me xwe nêzî me nedikirin. (Batman, 9, K)*

*Di jiyana min de gelek tişt guherîn, ez dikaribûm bi hevalên xwe re li dersê bixebitim. Dema ku pergala EBA'yê xera dibe, mamoste me ji dersê derdixin, ez mecbûr dimînim ku karê malê bikim û li dersan bixebitim. (Colemerg, 13, K)*

*Mala me ji salon û odeyekê pêk tê, ez tekane zaroka keçîn a malê me. Ez û kekên xwe di heman odeyê de dimînin. Ez ji vê rewşê hinekî aciz im, ez hîn nebûme ku her tim bi kekên xwe re bijîm, hevalên kekên min tên, em tev di nav hev de ne, nabe. Tevger û gotinên mêrane tên kirin, hevalên min ên keçîn tune ne, ez aciz dibim. (Amed, 14, K)*

*Weke ku ez di girtîgehê de bim, dîwar bi ser min de tên. Ez zêde aciz dibûm.*

*(Mêrdîn, 16,K)*

*Min ji perwerdehiya ji dûr ve tu tişt fêm nekir, em li EBA'yê jî pir geriyan lê me nedît. Mesela ez bi xwişk û birayên xwe re pir pevdiçim, derûniya min xera bû. (Amed, 12, K)*

*Ez aciz dibim. Geh kekê min ê mezin û geh jî kekê min ê biçûk dikeve EBA'yê, dor nayê ser min. (Şirnex, 11, L)*

*Ji ber ku em her tim li malê ne, tiştekî ku bê kirin jî tune ye, em hev dixwin. Em tev, kalê min ê nexweş jî tê de, em her tim di nav nîqaşan de ne. (Amed, 17, K)*

Paşê jî pirsên wek "Di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de di jiyana kesên ku di malê de biroj dixebitin de tu guherîn çêbûn? (Çûyîna kar, kirina karên nav malê, bi te re eleqedarbûn û hwd.) Ku çêbûn, guherînên çawa çêbûn?" hatin pirsîn. Wek bersiva vê pirsê, zarokên ku gotin tu guherîn çênebûne yan jî bi awayekî erênî çêbûne, hebûn. Zarokên ku bi awayekî erênî nirxandine, ligelhevbûna malbatê û ji bo parastina ji pandemiyê başbûna mayîna li malê, anîne ziman. Lê li vir jî ya girîng ew e, ku nêzî %65'ê zarokan bi awayekî neyînî bersiv dane vê pirsê. Hema bibêje tevahiya zarokên ku bi awayekî neyînî bersiv dane vê pirsê û sedem diyar kirine, gotine ku endamên malbatê ji ber pandemiyê nikaribûne bixebitin û ji ber vê yekê astengiyên aborî jiyane. Zarokeke 11 salî ya ku li Şirnexê dijî, wek sedema neyîniyê mecbûrmayîna lênihêrtina xwişk/birayê xwe, diyar kiriye.

Ji zarokên ku bersiva pirsa "Di perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên te yên bi mamosteyan re çawa bûn?" dane, 21 zarokan gotine, "kêmasî çêbûn", 49 zarokan gotine, "tu guherîn çênebûn", 16 zarokan gotine, "baştir bûn" û 28 zarokan jî gotine, "xerabtir bûn". Wek bersiva vê pirsê zarokeke keçîn a 10 salî ya ku li Amedê dijî, got "Ez qet neketim EBA'yê" destnîşankirina vê bersivê girîng e.

Piseke din jî, "Di dema perwerdehiya ji dûr ve de di têkiliyên te û mamosteyan de tu pirsgirêk derketin?" Nêzî nîvê zarokên ku hevdîtin bi wan re hat pêkanîn, gotin, ku di vê mijarê de tu pirsgirêk nejiyane, nîvê din jî got, ku bi giranî pirsgirêkên wek têkçûna pergala EBA'yê, baş nekişandina înternetê, nekişandina telefonê yên ku bingeha xwe ji pergalê werdigirin, jiyane. Ji derveyî vana bersivên ku zarokan dane vê pirsê, der barê pergala perwerdehiya ji dûr ve û di vê pergalê de têkiliyên xwendekar û mamosteyan de, daneyên girîng derpêş dikin.

*Erê. Hinek mamosteyên me nediketin EBA'yê. Û mamoste naxwazin ku xwendekaran têbigihîjin. (Amed, 16, L)*

*Erê. Ez mamosteyan nas nakim, ji wan bifikare me. (Wan, 16, K)*

*Erê. Dersên zindî xerab bûn, têkilî baş nebûn. Mamoste xweş vedigot lê pergal ne xweş bû. (Batman, 10, L)*

Herî dawiyê jî ji zarokan pirsa “Di dema perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên te û hevalên te çawa bûn?” hat pirsîn. Grafîka li jêrê rewşa bersivên ku zarokan dane vê pirsê nîşan dide. Di nav van bersivên ku ji bo vê pirsê hatine dayîn de, zarokekî got, ji ber ku bi nexweşîna Covid-19’ê ketiye, hevalên wî xwe jê dûr girtine û rastî cudakariyê hatiye. Ev tiştekî pir girîng e.

*Dema ku ez diçûm gel wan, ez diqewirandim. Ji ber ku ez bi nexweşînê ketibûm.*
*(Batman, 9, K)*





Grafîk 11. Dabeşiya hejmarî ya bersivên ku zarokan ji bo pirsa “Di dema perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên te û hevalên te çawa bûn?”

# 5. PÊŞNIYAZÊN ZAROKAN

*Bi ya min zarok dizanin, dê çi bikin. Bi ya min bila mezin baldar bin.(Amed, 14, K)*

Pirsên di vê beşê de, ji bo wergirtina pêşniyazên zarokan ên der barê perwerdehiya ji dûr ve û bi awayekî giştî pêvajoya pandemiyê de, hatine pirsîn. Pêşiyê ji zarokan pirsa, "Ku tu bûyayî, te yê pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve çawa sererast bikira? Te yê bixwesta çi bikira? Te yê çi biguherta?" hat pirsîn.




Grafîk 12. Dabeşiya hejmarî ya zarokên ku der barê sereastkirina pêvajoya perwerdehiya ji dîr ve de nêrînên xwe gotine

Wek ku di grafîka li jorê de jî tê dîtin, ji derveyî 15 zarokên ku nexwestine bersivê bidin û gotine, fikreke wan tune ye, 104 zarokan der barê sereastkirina pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de nêrînên xwe parve kirine. Dema ku mirov li fikrên zarokan ên der barê sereastkirina pêvajoya perwerdehiya ji dîr ve de dinihêre, tê dîtin, ku hejmareke hindik be jî hinek zarokan ji ber fikareyên têkildarî pandemiyê, gotine ku ew ji pêvajoya perwerdehiyê memnûn in. Hinek zarokan gotine, domkirina perwerdehiyê ya ji dûr ve, hinekan gotine, perwerdehiya rû bi rû û hinekan jî gotine, perwerdehiya têkel dê baştir be. Lê tê dîtin ku piraniya zarokên ku bersiv dane pirsê, ji perwerdehiya ji dûr ve ne memnûn in û pêşniyazên wan ên têkildarî vê rewşê hene. Weke ku dê ji vegotinên li jêrê jî bê fêmkirin, mijarên ku di van pêşniyazan de derketine pêş; ji bo sererastkirinên têkildarî pandemî û perwerdehiyê wergirtina nêrînên zarokan, jiholêrakirina sepanên ji ber kêmderfetiyan û cudakariya ku derdixin holê, ji bo çawaniya perwerdehiyê û domandina perwerdehiya rû bi rû cîbicîkirina bergiriyên guncav û têrker.

*Pêşiyê min ê ji hemû xwendekaran bipirsiya. Kê kîjan perwerde bixwesta bila beşdarî wê bibûya. Min ê saetên dersan li gor wê diyar bikirina. (Mêrdîn, 12, K)*

*Bêyî cudakarî min ê înternet û tablet bida her zarokî/ê. Di navbera zarokan de cudakarî hat kirin, dan hinek zarokan, nedan hinekan. (Ruha, 13, K)*

*Ku derfeta min hebûya ez ê jî beşdarî dersan bibûma. Paşve nemama. Ji bo her malê alîkarî bihata kirin û her kes biketa dersê. (Amed, 10, K)*

*Ku derfetên min hebûna, minê mamosteyên ku bizanibin vebêjin, peywirdar bikira. Min ê tablet bidana zarokan. Min ê înternet girêbida. (Mêrdîn, 16, L)*

*Pêşiyê min ê alîkarî bida her kesî, min ê ser maseyên me yên li polê bi caman bigirta, di navberan de em ê dûrî hev bisekinîna. (Batman, 10, L)*

Di vê beşê de wek pirsa duyemîn, ji zarokan pirsa "Pandemî didome. Ji bo ku tu û zarokên dinê vê pêvajoyê bi awayekî ewle, tendurist, aram û hêsan derbas bikin, gelo tu pêşniyazên te hene?" hat pirsîn. Ji derveyî 10 zarokên ku gotin, nizanim, qet lê nefikirîme, nexwestin bersivê bidin û pêşniyazên wan tune bûn, 109 zarokan pêşniyazên xwe anîn ziman. Dema ku nêrînên xwe yên der barê vê pirsê de vegotin, di nav pêşniyazên zarokan de bi pianî mijarên wek "bila maskeyan bidin ber dev û pozê xwe, bila dernekevin derve, bila ji bo paqijî û navberê baldar bin, bila nexweşîn biqede, bila tafilê derzî (parza) bê çêkirin" derketin pêş. Mirov dikare vê rewşê wek nîşaneya bi pandemiyê re zêdebûna asta fikareyên bi zarokan re fêm bike. Mirov dikare hejmareke hindik a pêşniyazan jî wek nîşaneyên newekheviya xwegihandina perwerdehiyê ya ku hatiye jiyîn, binirxîne.

*Bi ya min bila zarok ji bo dibistanê û dersan zêdetir demê veqetînin. Mamoste zêde demê venaqetînin ,divê em bi xwe derfetên xwe biafirînin. (Amed, 17, K)*

*Ezmûn, divê bi awayekî ku zorê nedin xwendekaran, bên kirin. Divê bifikirin, ku nikarin bikevin dersên zindî. (Ruha, 15, L)*

*Min ê tablet û kompîtur bidana, min ê ders birêkûpêktir bikirina. (Mêrsîn, 17, K)*

Mirov dikare bibêje ku di pêşniyazên hejmareke hindiktir a zarokan de jî ramanên têkildarî pêdiviya têkiliyên civakî û mafê leyîstinê, hatine bilêvkirin. Zarokên di vê komê de bi temenê xwe ji zarokên ku pêşniyazên der barê newekheviya derfetên perwerdehiyê de kiribûn, mezintir bûn. Divê mirov binî vê yekê xêz bike

*Mesela ji bo ku zarok aciz nebin, min ê di hundirê malên wan de parkên biçûk çêbikirina. Min ê pêlîstok bida, dê bileyîstina û bextewar bibûna. (Amed, 12, K)*

*Ji bo ku zarok aciz nebin, min ê pirs ji wan bipirsiyana. (Sêrt, 11, L)*

Di dawiyê de jî ji zarokan pirsa, "Tiştekî ku hûn bixwazin lê zêde bikin, heye?" hat pirsîn. Piraniya zarokan wek bersiva vê pirsê gotibin "Na" jî, ji bo ku rewşa ku zarok tê de ne nîşan bide, mirov dikare bersivên ku zarokan dane di bin sê serkan de kom bike. Li gor vê yekê.

1. Komek zarokan lê zêde kirine û gotine, ku dixwazin dibistan vebibin. Ji zarokan yekî got, "Ez dixwazim kêliyekê zûtir dibistan bên vekirin, ji ber temaşekirina televîzyonê derûniya min xera bû." Ji ber ku rewşa zarokên ku ji qadên perwerdehiyê û qadên civakîbûnê yên bingehîn bêpar dimînin, nîşan dide, ev nêrîn girîng e.
2. Di bersivên komeke din a zarokan de jî kêmasiyên aborî derketine pêş. Li gel zarokên ku têlildarî bikaranîna mafê perwerdehiyê tablet û înternet xwestine, zarokên ku gotine, ji ber ku bavê wan di girtîgehê de ye, derfetên wan ên aborî hindik in jî hene. Wek mînak zarokekî ji bo bersiva pirsa "Tiştekî ku hûn bixwazin lê zêde bikin heye?" gotiye, "Bavê min di girtîgehê deye, diya min bi fatûrayan re nagihîje, ev yek zorê dide min." Her çiqas dê û bavên wan ên ji azadiya xwe bêpar hatibin hiştin, tune bin jî, hinek zarokan bersivên wek "Alîkariya me bikin, tabletan bidin, cilên min tune ne", "Ez amûrên dibistanê, pênûs û lênûskan dixwazim" dane vê pirsê.
3. Mirov dikare bibêje, tê dîtin, ku yê zarokên di koma dawîn de asta fikareyên wan ên têkildarî pandemiyê derketine pêş. Dema ku mirov zarokên ku gotine, "tiştekî ku em lê zêde bikin tune ye" nehesibîne, 23 zarokan bersiv dane vê pirsê û ji wan jî 5'an nêrînên wek, "divê her kes maskeyan bide ber dev û pozê xwe, divê mirov bi tedbîr tevbigere û yên ku maskeyan nedin ber dev û pozê xwe, divê bên cezakirin." Bi lêv kirine.

## 6. NIRXANDIN Û ENCAM

*Ku pergaleke perwerdehiyê ya ku her kes wekhev be hebe, ez dixwazim ku ew be.*

*(Mêrdîn, 16, K)*

Ev lêkolîn ji aliyê Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê ve bi piştgiriya Bernameya Piştgiriya Rêxistinên Mafan a Piştgiriya Mafan û bi beşdariya 119 zarokên ku bûrsiyerên GİYAV'ê ne, hat kirin. Armanca bingehîn a lêkolînê ew bû, ku nêrîn û serpêhatiyên zarokan di çarçoveya mafê perwerdehiyê û xwegihandina perwerdehiyê de têbigihîje. Li gor vê armancê pirsên têkildarî xwegihandina perwerdehiya ji dûr ve û çawaniya perwerdehiyê, pirsgirêkên ku di xwegihandina perwerdehiyê de tên jiyîn û sedemên wan û di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên wan ên bi malbat, heval û mamosteyên wan re ji zarokan hatin pirsîn. Dîsa pêşniyazên zarokan ên di van mijaran de jî hatin pirsîn. Armanca vê yekê jî berbiçavkirina nêrînên zarokan bû. Di vê beşê de nirxandina giştî ya daneyên ku bi vê xebatê hatine berhevkirin, wek navend hat hilbijartin.

Ku mirov pêşiyê daneyên xebatê li gor mafê perwerdehiyê yê zarokan binirxîne, encama herî bingehîn a ku derdikeve holê ew e, ku zarok bi awayekî baş negihîştine perwerdehiya ji dûr ve. Sedema herî girîng a vê encamê jî, di asteke pêwîst de nebûna alav û amûrên bingehîn ên zarokên ku bi wan re hevdîtin hatiye kirin an jî kesên ji malbata wan e. Li gel vê yekê tê dîtin, zarokên ku di mala wan de înterneta malê tune ye û zarokên ku di mala wan de hejmara kesên di dema perwerdehiyê de pir e, zêdetir bi zehmetî xwe gihandine perwerdehiya ji dûr ve. Dîsa piraniya zarokên ku gotine dikaribûne beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bibin jî, gotine, ku bi awayekî nerêkûpêk karibûne beşdar bibin û rêbaza perwerdehiya ji dûr ve li gor wan ne sûdewer bûye. Ku mirov fikareyên têkildarî Covid-19'ê deyîne alîyekî, daxwaza zarokan bi piranî derbasbûna dibistanan a perwerdehiya rû bi rû ye, destnîşankirina vê yekê girîng e. Yek ji sedemên herî bingehîn ên ku zarok perwerdehiya ji dûr ve naxwazin, pêdiviya zarokan a civakîbûnê ye. Li gel vê yekê ji ber ku perwerdehiya ji dûr ve ji aliyê zarokan ve nayê fêmkirin, pirsgirêkên ku di şopandina dersan de tên jiyîn û xwenegihandina zarokan, mirov dikare wek sedemên din bihejmêre.

Ji derveyî pirsgirêkên xwegihandina perwerdehiyê, encameke girîng a din a ku di vê xebatê de derket holê jî, rewşa başbûna zarokan ji ber sedemên cuda bi xetereyê re rû bi rû ye. Ji van sedeman a pêşîn, ji ber ku derfeta zarokan a civakîbûnê tune ye, bi wan re tenêbûn bi pêş dikeve. Sedemeke din jî, wek encama ji ber pandemiyê bêkaramayîna endamên malbatê xwe negihandina çavkaniyên debarê û kêmbûna derfetên aborî, bandoreke neyînî li derûniya zarokan kiriye.  Bi vê rewşê re ji nêzik ve têkildar, hat dîtin, di rewşên ku beşdarî perwerdehiyê nebûne de bi hinceta "alîkariya" endamekî/e malbatê, zarokên keçîn beşdarî pêvajoya keda bêdesmiz a nav malê bûne û zarokên lawîn jî dest bi xebatê kirine. Derdikeve holê, ku ev rewş, di pêvajoyên pêş de dê bi xwe re xetereyên wek qutbûna ji perwerdehiyê, karkeriya zarokan û zewicandina zarokan a bi darê zorê bi xwe re bîne.

Piştî vê nirxandina giştî, li gor çarçoveya der barê mafê perwerdehiyê de ya ku di beşa Destpêkê de hatiye danîn, ku em encaman pêşiyê li gor veqetandina budçeyê ya di pêvajoya pandemiya Covid-19'ê de binirxînin, tê dîtin, ku budçeya Wezareta Perwerdehiyê ya ku di sala 2020'an de 125 milyar û 397 milyon TL bûye, di pêvajoya ku pandemî didomiya de, ji bo sala 2021'an wek 146 milyar û 920 milyon TL hatiye diyarkirin (KESK, 2020). Her çiqas di budçeya wezaretê de bi awayekî hejmarî zêdebûn pêk hatibe jî, ku mirov budçeya 2021'an li gor budçeya rêveberiya navendî ji aliyê rêjeyê ve binirxîne, tê dîtin ku para wê %10,69 e. Ev rêje di sala  2020'an de %11,45' bûye (berhema navborî). Ji ber vê yekê jî di rewşeke qeyranê ya ku xwegihandina perwerdehiyê ew qas hatiye sînordarkirin de zêdenekirina budçeya ku ji bo perwerdehiyê tê veqetandin, li gor berpirsiyarên dewletê yên pêşkêşkirina derfetên perwerdehiyê, nakokî ye.

Mijareke din a têkildarî veqetandina budçeyê jî, bi nirxandina daneyên berdest ên lêçûnên malbatan derdikeve holê. Di Nûsafa Şopandina Pevrêvebirin û Fînansmana Perwerdehiyê (2020: 45) ya ku ji aliyê Hewldana Reforma Perwerdehiyê ve hatiye amadekirin de ev tespîta girîng heye: "Li Tirkiyeyê ji ber ku di nav lêçûnên malbatê de para çavkaniyên ku ji perwerdehiyê re tên veqetandin zêde ye, di navbera rewşa civakî û aborî û serkeftina xwendekaran de têkilî heye, pêdiviya ku ji bo zarokên ku ji aliyê civakî û aborî ve di nav şert û mercên bidezavantaj de ne, piştgiriya fînansî bê kirin, zêde dibe. Piştî pandemiya COVID-19'ê dibe ku ev pêdivî zêdetir bibe." Li ser bingeha vê tespîtê, di çarçoveya vê xebatê de, me ji bo wergirtina agahiyan serî li Wezareta Perwerdehiya Neteweyî da. Serlêdan û bersiva serlêdanê dikare di PÊVEK 3'yê de bê dîtin. Di bersiva serlêdana wergirtina agahiyan de bersiva pirsên; li kê derê li çend zarokan tablet hatine belavkirin, lêçûnên perwerdehiya rû bi rû û yên perwerdehiya ji dûr ve yên ji bo xwendekarekî/ê, piştgiriyên madî û yên aynî (amûr) yên ku ji aliyê wezaretê ve hatine dayîn, nehatine dayîn, bi tenê ji bo navnîşana ebadestek. meb.gov.tr beralîkirin pêk hatiye. Agahiyên  ku bi riya vê malperê hatine belavkirin, li gor îstatîstîkên gelheyê yên TÜİK'ê yên 2019'an, li ser bingeha gelheya herêman a di dema perwerdehiyê de hatin rûberîhevkirin û encamên ku derketin holê, di tabloya li jêrê de bi kinasî hatn nîşandan.

| HERÊM | Gelheya Navbera 5 û 18 saliyan | Hejmara Xalên Piştgiriyê yên EBA'yê | Rêje |
|---|---|---|---|
| Derya Reş | 1.336.474 | 2.249 | 16 |
| Derya Spî | 2.239.040 | 2.687 | 12 |
| Ege | 1.771.997 | 2.045 | 11 |
| Anatoliya Navîn | 2.519. 398 | 2.421 | 9 |
| Rojhilatê Anatoliyê | 1.481.697 | 1.270 | 8 |
| Marmara | 4.632. 915 | 3.546 | 7 |
| Başûrê Rojhilata Anatoliyê | 2.550.150 | 1.375 | 5 |

Tablo 2: Li gor gelheya temenê navbera 5 û 18'an rêjeya hejmara Xalên Piştgiriya EBA'yê yên li herêman

Wezîrê Perwerdehiya Netewî Ziya Selçuk di daxuyaniya  ku di 2'yê Rezbera 2020'an de daye de, der barê xalên piştgiriya EBA'yê de wiha gotiye: "Ji bo ku xwendekarên me yên ku nikarin ji malê beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bibin, sûdê ji EBA'yê wergirin, me li dibistan û saziyên xwe xalên piştgiriya EBA'yê pêk anîn." Wek ku ji tabloya li jorê jî bi awayekî zelal dixuyê, rêjeya hejmara xalên piştgiriya EBA'yê yên li gor gelheya zarokan li herêman hatine sazkirin, ne li gor gelheyê ye. Di vê xebatê de, di çarçoveya hevdîtinên ku bi zarokan re hatine kirin de bi tenê zarokekî got, ku ji xala piştgiriya EBA'yê sûd wergirtiye. Der barê ku xalên piştgiriya EBA'yê li gor kîjan pîvanan hatine sazkirin de, ne pêkan e ku mirov behsa pêvajoyeke zelal bike. Li parêzgehên ku anîna zarokan û gelheya zarokan lê zêde ye (TÜİK, 2020), xalên piştgiriya EBA'yê yên ku hatine sazkirin, kêmtir in, ev sepan wek rewşeke bi pêdiviya jiholêrakirina astengiyên xwegihandina perwerdehiyê ya ku di çarçoveya 4A'yê de hatiye diyar kirin re nakok dixuyê.

Di pêvajoyeke ku hîna kêmasî û newekheviyên xwegihandina perwerdehiyê didomiyan de, tevî ku hîna pêşî li pandemiyê nehatibû girtin jî, piştî civîna Lijneya Wezîran a ku di mêjûya 1'ê Adara 2021'an hat lidarxistin, biryar hat girtin, ku di Pêvajoya Asayîbûna Bikontrol a nû de perwerdehiya rû bi rû dest pê bike. Di çarçoveya biryarên ku hatibûn wergirtin de, parêzgeh

li gor çar astên xetereyê hatibûn dabeşkirin. Piştî van geşedanan Wezareta Perwerdehiya Netewî daxuyaniyek da û li gor vê daxuyaniyê, dê di mêjûya 2'yê Adara 2021'an de li tevahiya saziyên pêşdibistanê, dibistanên seretayî, polên 8 û 12'emîn li tevahiya welat perwerdehiya rû bi rû dest pê bikira. Di heman demê de li parêzgehên ku di nav koma xetereya kêm û navinc de hatibûn nîşandan, dê li tevahiya saziyên pêşdibistanê, dibistanên seretayî, dibistanên navîn û dibistanên amadehiyê perwerdehiya rû bi rû dest pê bikira. Daneyên Eğitim-Senê yên têkildarî zêdebûna bûyeran ên meha Adara ku tê de dibistan vebûbûn, di tabloya li jêrê de bi kinasî hatine dayîn:

| | 15 Reşemî-5 Adar | 5-12 Adar | 12-19 Adar | 19-26 Adar |
|---|---|---|---|---|
| Xwendekar | 97 | 269 | 433 | 1125 |
| Mamoste | 95 | 141 | 475 | 669 |
| Xizmetkar& Karmend | 10 | 22 | 35 | 43 |

Tablo 3: Li gor daneyên Eğitim-Senê hejmara bûyerên Covid-19'ê yên ku di navbera 15'ê Reşemiyê û 26'ê Adarê de li dibistanan hatine destnîşankirin

Weke ku di tabloya li jorê de jî tê dîtin, di Pêvajoya Asayîbûnê ya Bikontrol de bêyî ku qadên perwerdehiyê yên tendurist û ewle bên amadekirin, di parzekirinê de pêşekiyê bidin kedkarên perwerdehiyê, perwerdehiya rû bi rû dest pê kir û vê yekê kir ku hem di nava kedkarên perwerdehiyê de û hem jî di nava xwendekaran de bûyerên nexweşînê zêde bibin. Di vê pêvajoyê de ji ber ku li tevahiya welat nexweşîn zêde bû, ji hefteya pêşîn a meha Avrêlê bi şûn de perwerdehiya rû bi rû gav bi gav hat bidawîkirin. Bi vî awayî, ji ber pandemiya Covid-19'ê ya ku li gor daxuyaniyên fermî li Tirkiyeyê di Adara 2020'an dest pê kiribû, ev nêzî salekê ye xwendekar di rewşeke ku nikaribin xwe bigihînin perwerdehiyeke birêkûpêk û baş de hatine hiştin. Dîsa, ji ber ku ev ji salakê zêdetir e her carê dest bi perwerdehiya rû bi rû tê kirin û piştî ku nexweşîn zêde dibe, dîsa perwerdehiya ji dûr ve dest pê dike, dike ku bi zarokan re hesta nediyariyê û ji bo domandina perwerdehiyê bêhêvîbûn çêbibe, ji ber vê yekê jî bi awayekî neyînî bandorê dike.

Wek encam, vê xebatê nîşan da ku di pêvajoya pandemiya Covid-19'ê de ji ber baş birêvenebirina pêvajoyê, ji bo perwerdehiyê veneqetandina budçeya pêwîst, ji bo ku zarok xwe bigihînin perwerdehiyê pêşkêşnekirina çarçoveyeke baş û derfetên wekhev, bi tenê ji bo mafên zarokan ê perwerdehiyê ne gefek bûye, bi xwe re xetereyên têkildarî dahatûya zarokan jî derxistiye holê û ev yek bi serpêhatiyên zarokan nîşan daye. Serdemên qeyranan jî tê de, pêwîstiya di hemû şert û mercan de pêkanîna xwegihandina perwerdehiyeke baş a ku di gelek mijarên wek kêmkirina xizaniyê, pêkhatina berpirsiyariyên têkildarî mafên mirovan û pêşxistina wekheviya zayenda civakî de xwediyê girîngiyeke mezin e, bi vî awayî careke din hatiye nîşandan.

## ÇAVKANÎ


- Ataman, H. (2008). Eğitim Hakkı ve İnsan Hakları Eğitimi. İnsan Hakları Gündemi Derneği. Navnîşana xwegihandinê: http://www.ceidizleme.org/ekutuphaneresim/dosya/220_1.pdf
- Korlu, Özgenur. (2020.) Eğitim Yönetişimi ve Finansmanı Eğitim İzleme Raporu. ERG. Navnîşana xwegihandinê: https://www.egitimreformugirisimi.org/wp-content/uploads/2010/01/EIR2020_EgitimYonetisimiVeFinansmani.pdf
- KESK. (2020, 13 Aralık). 2021 MEB Bütçesi, Pandemi Döneminde Eğitimin İhtiyaçlarını Karşılamaktan Uzaktır. Navnîşana xwegihandinê: https://kesk.org.tr/2020/12/13/2021-meb-butcesi-pandemi-doneminde-egitimin-ihtiyaclarini-karsilamaktan-uzaktir/
- TÜİK. (2020). Doğum İstatistikleri, 2019. Sayı: 33706. Navnîşana xwegihandinê: https://tuikweb.tuik.gov.tr/HbPrint.do?id=33706
- UNICEF. (2016, 18 Eylül). Piştî ku di nûsafeke hat weşandin de behsa qeyraneke kurewî ya di hîndekariyê de hat kirin, UNICEF'ê banga zêdekirina lêçûnên ji bo qada perwerdehiyê kir. Daxuyaniya Çapemeniyê. Navnîşana xwegihandinê: https://www.unicef.org/turkey/bas%C4%B1n-b%C3%BClterleri/yay%C4%B1nlanan-bir-raporun-%C3%B6%C4%9Frenimde-k%C3%BCresel-bir-krize-i%C5%9Faret-etmesi-%C3%BCzerine-unicef

# PÊVEK

## PÊVEK 1. ÇAVDÊRIYÊN DER BARÊ HEVDÎTINAN DE

1. Beşeke pir zêde ya zarokan gotin, ku ji ber bergiriyên ku bi sedema pandemiyê hatine sepandin “aciz bûne”. Zarokên ku pêvajoya civakîbûna wan qut bûye, têkiliyên wan ên bi hemsalên wan re sînordar bûne, vê yekê jî encama mijara gotinê derxistiye holê. Dîsa hinek zarokan jî gotin, ku ji ber ku bi pandemiyê re pergala jiyana wan guheriye, bi neyînî bandor bûne.

2. Hinek zarokan gotin, ku ji ber rewşa aborî ya malbatê zehmetiyan dikişînin, rewşa aborî ya ku berê xerab bûye, bi pandemiyê re xerabtir bûye.

3. Piraniya zarokên ku beşdarî lêkolînê bûn, li parêzgehên herêmên Rojhilat û Başûrê Rojhilata Anatoliyê yên ku li gor tevahiya Tirkiyeyê rêjeya zarokanînê zêde ye, dijîn. Ji ber vê yekê hejmara xwişk û birayan û hejmara endamên malê yên di dema perwerdehiyê de yên zarokên ku bi wan re hevdîtin hatiye kirin, zêde ye. Zarokên ku ji bo wan xwegihandina amûrên wek kompîtur, tablet û hwd. nehatiye hêsankirin, hem ji ber vê sedemê hem jî ji ber di malê de nebûna cihên xebatê yên guncav, mexdûr bûne.

4. Yên ku ev lêkolîn kirine, bandora newekheviya zayenda civakî di vê lêkolînê bi xwe de jî dîtine. Li gor vê yekê di pêvajoya pandemiyê de li zarokên keçîn beşdarbûna xebata nav malê hatiye ferzkirin, dîsa hatiye dîtin, ku hinek zarokên lawîn dest bi xebatê kirine.

5. Yên ku hevdîtin pêk anîne, hîs kirine, ku zarok tu wateyê nadin mêjûyên ku Wezaret ji bo vebûn û girtina dibistanan dide, dibêjin dê careke din venebe û bêhêvîbûnê dijîn.

6. Di hevdîtinan de hat dîtin ku bi giranî xwendekarên ku amadekariya ezmûnên dibistanên amadehiyê û ezmûnên zanîngahan dikin, ji aliyê derûnî ve bi awayekî neyînî bandor dibin.

7. Herî dawiyê hat dîtin, ku bi vê xebatê bi zarokan re bendewariyeke piştgiriya madî çêbûye. Piştî ku hevdîtin bi dawî dibû, gelek zarokan dipirsî û digot, “Hûn ê ji bo tabletan piştgiriyê bidin?” Piştî ku xebat bi dawî bû jî ev daxwaz domiyan.

# PÊVEK 2. SERLÊDANA WERGIRTINA AGAHIYAN Û BERSIVA WÊ

Agahiyên Serlêdanê

Hejmara Serlêdanê

2101262081

Dema Serlêdanê

16/03/2021 11:51:34

Cureyê Serlêdanê

Wergirtina Agahiyan

Rewşa Serlêdanê

Serlêdan Hat Kirin

## Pirs

Ez bi armanca dîtin, fêmkirin û berbalavkirinê bi navê "Di Pêvajoya Pandemiyê De Rewşa Xwegihandina Perwerdehiyê ya Zarokan" xebateke lêkolîn û şopandinê dikim. Pêdiviya min bi çend daneyên ku ez difikirim, dê xebata min a nûsafkirinê xurt bikin, heye. Ez dixwazim der barê daneyên ku di çarçoveya vê xebatê de pêdiviya min pê heye de çend pirsan bipirsim.

1. Di pêvajoya pandemiya COVİD-19'ê de li Tirkiyeyê çend tablet li xwendekaran hatine belavkirin? Dabeşiya van tabletan a li gor parêzgeh û astên perwerdehiyê bi çi rengî ye?
2. Ji bo her asta perwerdehiyê gelo lêçûna xwendekarekî/ê a ji bo perwerdehiya rû bi rû û perwerdehiya ji dûr ve çiqas e?
3. Di pêvajoya pandemiya COVİD-19'ê de Wezareta Perwerdehiya Netewî kîjan alîkariyên aborî û yên wekî din pêşkêşî xwendekaran kirine?

Ez bi rêzdarî daxwaz û pêşkêşî bala we dikim, ku hûn di demeke kin de bersivê bidin pirsên min ên têkildarî mijarê.

## Bersiv:

*Navê Sazî û Yekeyê: WEZARETA KARÊN PERWERDEHIYÊ (WKP) > SEROKATIYA AMADEKIRINA PROJEYAN*

Agahiyên ku hatine xwestin tevî ku di çarçoveya Xala 7'emîn a Zagona Mafê Wergirtina Agahiyan a Bi Hejmara 4982'yan de tên nirxandin jî; Wezareta Me di pergala perwerdehiya ji dûr ve ya ku ji ber Koronavîrûsê derket holê de, ji bo xwendekarên ku tablet, înternet û kompîtura wan tune bûn, li her parêzgehê di serî de li laboratuvarên enformatîk ên dibistan û saziyan gelek xalên piştgiriya EBA'yê hatin pêkanîn, li gor daxwaz û xwestekê hejmara Xalên piştgiriya EBA'yê tên zêdekirin. Dîsa ji bo xwendekarên ku li qadên gundewar dijîn û kompîtur, tablet û înterneta wan tune ne û pirsgirêkên wan ên çûnûhatinê hene, Wesayîtên Piştgiriyê yên EBA'ya Gerok hatine amadekirin û dîsa li gor daxwaz û xwestekê hejmara wan tê zêdekirin. Xwendekarên ku derfetên wan tune ne, ji xalên piştgiriya EBA'yê yên herî nêzî navnîşana wan ên ku li gor pîvanên paqijî, navber û maskeyê yên pêwîst hatine amadekirin, sûdê werdigirin. Xalên piştgiriya EBA'yê û Wesayîtên Piştgiriyê yên EBA'ya Gerok di malpera Wezareta Me http://ebadesteknoktasi.meb.gov.tr'yê de tên nîşandan.

Dîsa li gor pîvanên wek rewşa dahata malbatê, hejmara xwişk û birayên ku diçin dibistanê, xwegihandina xalên piştgiriya EBA'yê tablet hatin belavkirin, li gel tabletan pakêtên înternetê yên bi xeta 4.5G a GSM'ê û kotaya 25 GB'an hatin belavkirin. Armanca me ew e, ku heta hefteya sêyemîn a meha Adarê hejmara tabletên ku Wezareta Me belav dike, li gor pêvajoya bidestxistinê ji 600 hezarî bibihure.

## PÊVEK 3. FORMA PIRSAN

# LÊKOLÎNA NÊRÎN Û PÊŞNIYAZÊN ZAROKAN ÊN DER BARÊ SERPÊHATIYÊN WAN ÊN PÊVAJOYÊN PERWERDEHIYÊ YÊN DI SERDEMA PANDEMIYÊ DE

## AGAHIYÊN NASKIRINÊ

1) Nav û Paşnavê Te?

2) Tu Çend Salî yî?

3) Zayenda Te? Keç ( ) Law ( ) Wekî Din ( ) Diyar Nekir ( )

4) Bajarê Ku Tu Lê Dijiyî: Navçe: Gund:

5) Tu Diçî Kîjan Dibistanê?

6) Tu Diçî Pola Çendan?

7) Xwişk û Birayên Te Hene?

Na ( )

Erê ( ) be,

Hûn Çend Xwişk û Bira ne?

Temenê Wan:

Yên Diçin Dibistanê Hene?

Dibistana Seretayî

Dibistana Navîn

Dibistana Amadehiyê

## DER BARÊ PÊVAJOYA PANDEMIYÊ DE NIRXANDINA GIŞTÎ

8) Pandemî didome. Rojeke te çawa derbas dibe? Gelo tu dixwazî bi me re parve bikî? Tu saet di çendan de radibî? Tu çi dikî? Bi kê re dikî?

9) Dema ku tu li rewşa xwe û li rewşa zarokên din difikirî, pandemiyê bandoreke çawa li jiyana te kir?

10) Mijarên ku te tê de zehmetî kişandin hebûn? Tiştên ku tu bixwazî parve bikî hene?

## NIRXANDINA DER BARÊ QADA PERWERDEHIYÊ DE

11) Rewşa dibistanê çawan e?

12) Tu têkiliya xwe ya bi dibistanê re çawa didomînî?

( ) Ku perwerdehiya ji dûr ve be, rojê/ hefteyê çend saetan?

( ) Ku perwerdehiya rû bi rû be, çend rojan?

( ) Ku perwerdehiya ji dûr ve û ya rû bi rû bi hev re bin, her yek çend roj/ saet e?

( ) Ku Her du jî nebin, çima?

13) Rojên ku tu naçî dibistanê tu çi dikî?

14) Li malê înternet heye?

( ) Na

( ) Ku hebe hûn çawa xwe digihînine?

(Bi înterneta telefonê, înterneta cîranan, înterneta malê û hwd.)

15) Li malê kompîtur an jî tableteke ku tu bi kar tînî heye?

( ) Na

( ) Ku erê be; ya te ye?

Wekî din kî bi kar tîne?

(Hejmara kesan):

16) Dema ku cara pêşîn dibistan ji ber pandemiyê hatin girtin, gelo tu bi hêsanî dikaribûyî beşdarî dersen ji dûr ve bibî?

( ) Ku na be, çima?

( ) Ku erê be, te kîjan amûr bi kar anîn? (Bersiv dibe ku ji yekê zêdetir bin)

( ) Televîzyon ( ) Tablet ( ) Kompîtur ( )Telefon ( ) Yên din

17) Piştî ku dibistan ji ber pandemiyê hatin girtin, tu dikaribûyî beşdarî perwerdehiya ji dûr ve bibî?

( ) Na ( ) Ku erê be ( ) Birêkûpêk ( ) Ne birêkûpêk, çima?

18) Dersên ku tu bi riya înternet an jî televîzyonê werdigirî, li gor te gelo sûdewer in?

Çima?

19) Gelo tu dikarî perwerdehiya ji dûr ve û demên ku tu diçûyî dibistanê, beşdarî dersan dibûyî, bidî ber hev?

Li gor te kîjan baş e, çima?

20) Perwerdehiya ji dûr ve bandoreke çawa li te kir? Tu dikarî hinekî vebêjî? (Destpêkên dersan, şopandina dersan, têgihîştin, pêvajoya hînbûnê, têkiliya bi manoste yan jî hevalên polê re, bikaranîna demê, nebûna li polê, baldarnebûn û hwd.) Çima?

( ) Erênî ( ) Neyînî ( ) Bandor nekir.

Lewre...

21) Di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de mayîna di hundirê malê de çawa bû? Tu dikarî hinekî vebêjî? Çima?

( ) Erênî ( ) Neyînî ( ) Bandor nekir.

Lewre...

22) Di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de biroj di hundirê malê de kesekî/e mezin heye?/ Hebû?

( ) Ku erê be, kî?

( ) Ku na be, çima?

( ) Ji ber ku kesên mezin biroj diçin/diçûn kar

( ) Wekî din

23) Di pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve de – ku hebin- di jiyana kesên ku di malê de biroj dixebitin de tu guherîn çêbûn? (Çûyîna kar, kirina karên nav malê, bi te re eleqedarbûn û hwd.). Ku çêbûn

( ) Erênî ( ) Neyînî

24) Dema ku têkildarî perwerdehiyê pêdiviya te bi tiştekî çêbû yan te tiştek xwest an jî têkildarî dersan te alîkarî xwest kesekî/e ku alîkarî bida te hebû?/ Heye? (Dikarî ji yekê zêdetir vebijêrkan hilbijêrî )

( ) Dayîk ( ) Bav ( ) Xwişk û bira ( ) Wekî din ...

24) Perwerdehiya ji dûr ve ji bo me hemûyan pêvajoyeke pir nû bû. Bi ya te kîjan rêbaz ji bo te û zarokên din sûdewer e? Çima?

( ) Perwerdehiya ji dûr ve, lewre...

( ) Perwerdehiya rû bi rû, lewre...

( ) Her du jî, lewre ...

( ) Tu yek jî...

25) Di perwerdehiya ji dûr ve de mijarên ku zor dan te hebûn?

26) Lê gelo aliyên ku hêsan dikirin?

27) Di dema perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên te yên bi mamosteyên te re çawa bûn?

( ) Baştir ( ) Tiştek neguherî ( ) Hinek astengî derketin ( ) Xerabtir

Çawa û çima? Dikarî hinekî vebêjî?

28) Di dema perwerdehiya ji dûr ve de di têkiliyên te û mamosteyan de tu pirsgirêk derketin?

( ) Na ( ) Fikreke min tune ( ) Ku erê be dikarî vebêjî?

29) Di dema perwerdehiya ji dûr ve de têkiliyên te yên bi hevalên te re çawa bûn?

( ) Baştir ( ) Tiştek neguherî

( ) Hinek kêmasî çêbûn ( ) Xerabtir Çawa û çima, dikarî hinekî vebêjî?

# DI ÇARÇOVEYA PÊVAJOYA PANDEMIYÊ DE PÊŞNIYAZÊN JI BO PÊVAJOYÊ Û PERWERDEHIYA JI DÛR VE

30) Ku tu bûyayî, te yê pêvajoya perwerdehiya ji dûr ve çawa sererast bikira? Te yê bixwesta çi bikira? Te yê çi biguherta?

31) Pandemî didome. Ji bo ku tu û zarokên dinê vê pêvajoyê bi awayekî ewle, tendurist, aram û hêsan derbas bikin, gelo tu pêşniyazên te hene?

32) Mijareke dinê ya ku tu bixwazî lê zêde bikî heye gelo?

...

Ji ber ku te dema xwe veqetand, ji niha ve spas

Elazığ Cad. Mimar Sinan Mah. Diyar Galeria C Blok Kat:4 No:10 Yenişehir / Diyarbakır
t: (0412) 223 00 90   f: +90 (412) 00 90   e: g.vakfi@gmail.com   w: goctvakfi@gmail.com

www.giyav.org.tr